Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1217 | 30-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Li kampa Newroz ji bo zarokên koçber çalakiyên rengîn tên lidarxistin



Navenda Nûçeyan

**Di bin şert û mercên dijwar de zarokên koçber ên Kampa Newroz ya bajarê Dêrikê li Navenda Çand û Huner ya li kampê hat avakirin xwe fêrî hunerê dikin.**

Piştî êrişên dagirkeriyê yê dewleta Tirk di sala 2019'an de li ser Serêkaniyê û Girêspî pêk anî, bi hezaran kes neçar man dev ji cih û warên xwe berdin. Hinek ji malbatan jî li Kampa Newroz a bajarê Dêrikê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi cih bûn. Li ser bingehê daxwazên zarokên li kampê Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di sala 2022'an de Navenda Çand û Hunerê li Kampa Newroz vekir.

Di navendê de beşê stran, govend, kişik(setrenc) gok û şanoyê dihewîne ku 6 mamosteyên ku bi xwe koçber in û di kampê de dijîn perwerde didin zarokan. Zarokên Kurd û Ereb yên bi hev re li kampê dijîn û perwerdeyê dibînin ji 8 salî heta 15 salî ne. Hejmara zarokan ji 90'î zêdetir e û li ser komên ku tê de cih digrin belav dibin.

Rêveberên navenda çand û hunerê ya kampa Newroz tekezî li ser girîngiya navendê kirin di rewşa ku koçber dijîn de, nexasim rewşa xwendinê ya zehmet ji bo zarokên kampan ji bo zarokan hinek be jî dibe mijûlî. Her wiha rêveberiyê da zanîn ku ew hewl didin hemû malbatan hişyar bikin da ku zarokên xwe bi pêş bixin. Kesên ku di navendê de dixebitin hemû xwebexş in û ji bo pêşxistina xebatên navendê daxwaza alîkariyê dikin.

**'Di lîstika setrencê de serkeftî ji pêşbirkan derdikevin'**

Fereh Hiso 14 salî ye ji bajarê Serê Kaniyê ya dagirkirî ye, nêzî sê salan e li kampa Newroz tevî malbata xwe bi cih bûye, ew niha li navenda çand û hunerê ya kampê fêrî setrenc, goved û wênexêziyê dibe, dibêje: "Navenda çand û hunerê ez fêrî setrencê kirim, ji ber ku min xwest ez fêr bibim. Destpêkê tirs hebû, min digot ez ê nikaribim fêr bibim lê min ev qonax derbas kir û niha jî di asta herî pêş de cihê xwe digrim. Em beşdarî gelek pêşbirk, şahî û mihrîcanan dibin û bi ser dikevin. Dixwazim di pêşerojê de bêtir xwe bi pêş bixim û beşdarî pêşbirkên mezintir bibim."

**'Şano dihêle ku ez tiştên nexweş ji bîr bikim'**

Fatma El-Etiye ya 12 salî jî ji Serê Kaniya dagirkirî ye di beşa şanoyê de cih digre, di dema kêşana navendê, wê li gel çend hevalên xwe şanoyek li ser têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan pêşkêş dikirin. Fatma da zanîn ku ew şanoyek hişyariyê ji bo civakê pêşkêş dikin ji bo ku tundiya li ser jinan bi dawî bibe û wiha pê de çû: "Nêzî sê salan e bi berdewamî perwerdeyê li navenda çand û hunerê dibînim. Em fêrî gelek tiştên çandî û hunerî dibim. Min di asta yekem de lîstikvanî û şano hilbijart ji ber ku ez ji vê beşê hez dikim."

Fatma El-Etiye destnîşan kir ku ew rehet dibe dema beşdarî çalakiyan dibe û got ku dema mezin bibe dixwaze bibe mamoste perwerdeyê bide zarokan û wiha bi dawî kir: "Em gelek kêfxweş dibin dema tên navendê lê di heman demê de em dixwazin alîkarî ji bo me were pêşkêşkirin. Rêxistinên mirovî baldarî nadin xebata ku em dimeşînin."

# Bi tabloyên xwe dengê civakê dide bihîstin

Ji bo li dijî hişmendiya zilam dengê jinan bide bihîstin, tabloyên bi rengê cuda çêdike. Wênesaz Olîn Kalê da zanîn ku zehmetî ji bo wê nabin kelem. Huner ji aliyê civakan ve ji bo afirandina bîr û misogerkirina civakê di tevahiya dîrokê de hatiye bikaranîn. Ruxmî gelek astengiyan jî jinan di hemû qadên hunerê de rola herî serketî lîstiye. Yek ji wan jî Olîn Kalê ye ku li hemberî zextên civakî li ber xwe daye û xwe di şaxên hunera wênesaziyê de ava kiriye. Dihizire ku huner ne tenê naveke; xwedî hêzek e û dikare civakê biguherîne û zextên ku li jinan hatine ferzkirin bişkîne.

Olîn Kalê da zanîn ku hezkirina wê bi wênesaziyê re ji zarokatiyê ve destpê kiriye û heya roja îro berdewam dike û wiha dest bi axaftina xwe kir, "Min pir ji wênesaziyê hez dikir, lê sala 2022'an min ev hezkirin nîşan da û min xwest xwe pêş bixim. Li hemberî gelek zehmetiyan ez ranewestiyam û min rîşa xwe bi rengên cur be cur pêş xist. Her wiha bi tabloyên xwe ez tevlî pêşengihan bûm. Pêşengeha



destpêkê ya ku ez tevlî bûm ya 'Qêrîna Çav' bû. Min dixwest di wê wêneya xwe de rengê welatê xwe, dengê êşa welatê xwe ji cîhanê re nîşan bidim."

**Koma Orchid ji bo Olîn bû hêz**

Olîn Kalê diyarkir ku bi avakirina Koma Orchid re hîn bêhtir pêş ket û wiha domand, "Ez pir kêfxweş bûm dema Koma Orchid hat avakirin û ez tevlî bûm. Dema me bi hev re kolanên bajarê xwe dixemiland û şopa me di her cihekî de dima. Tişta herî ku Koma Orchid bala min kişand, alîkariya wê bi zarokên nexweş û zarokên şehîdan re bû. Tişta me ji tabloyên xwe yan jî wêneyên xwe qezenc dikir, li zarokên şehîdan û nexweş re dihat şandin. Her wiha em di pêşengiha 'Çîroka Serkeftinê' de jî pêşdar bûn."

**'Jin rengê xweşik dide civakê'**

Olîn Kalê destnîşan kir ku wek jin li hemberî hişmendiya civaka serdest û zilamperest kişandiye lê ev yek ji bo xwe nekire binketin û wiha pêl da axftina xwe, "Ez wek jinek Kurd destpêka min dest bi hunera wênesaziyê kir erê kirina civakê zehmet bû. Ji ber ku huner layiqê jin nedidîtin û nedixwestin jin çand û hunera xwe pêş bixe. Di nêrîna min de em jin bi taybet rengê herî xweşik dikarin bidin jiyan ê. Em dikarin bi hestên xwe yê hunerî hêviya civaka xwe bi hêz bikin. Lê di heman demê de em wek jin rastî van astengiyên bi vî rengî tên, ew jî sedema wê bandora hişmendiya zilamê serdest yê ku jin ji bo xwe koke didît. Em hewil didin li dijî vê hişmendiyê têkoşîn bikin û di hemû aliyên civakê de bibin pêşeng." **ANF**

bi kamîreya ronahî



Kampa Waşûkanî

## FERHENGA BIWÊJAN

**Teşkê heşkê li meşkê dide:**
- Tiştên ne bi ser hev ve dike; tiştên bêserûber dike.

**LI SER BETALÎ Û TERALIYÊ**

**Barê rîxê ye:**
- Giran e; nikare di bin xwe de rabe.
**Giraniya xwe ji ser xwe avêt:**
- Êdî weke berê ne sist e; teralî/giranî pê re nemaye.
**Karê bi serê qirşikekê nake:**
- Teral e; beredayî ye; bi kêrî tiştekî nayê.
**Ketiye ser enîşkê:**
- Betal e; ti karî nake; ji kar direve.
**Kûp e:**
-Bêkar e; teral e; weke kûpekî her dem rûniştî ye.
**Li qûnê rûnişt:**
- Ti kar nekirin; xwe hişt betal; teralî kir.
**Nexweş e, parîxweş e:**
- Xwe li nexweşiyê datîne da kar neke, da tiştên xweş bixwe, da hin lê binêrin.
**Pal daye:**
- Betal e; ti karî nake; ji kar direve.
**Qaziyê ji qûn ve ye:**
- Teraliyê dike; pir sist e; xîret nake ji bin xwe rabe ser xwe.
**Qûngiran e:**
- Bêxîret e; teral e; sist e; nikare ji bin xwe rabe.
**Siya xwe dipîve:**
- Ti karî nake; teral e.
**Şeh û mirak (eynik) eywelleh, kar û şixul na welleh:**
- Ji bejin û bala xwe re temam e, lê destê xwe navêje karekî; yê keyfê ye, weke din bi kêrî tiştekî nayê.
**Teralê Bexdayê ye:**
- Teral e, ji teralî ti karî nake.
**Te xew yan te rava (nêçîr) kew:**
-Ji bo kesê teral, yan jî kesê kar ne di dema wî de dike tê gotin.
**Ûzeûza zarokan ji birçîna bav dipîve gasîna:**
- Teral e; barûte ye; beredeyê ye.
**Yê li nava lihêfê ye:**
- Teral e.
**Yê sûkan e:**
- Betal e; karekî bisûd nake.

**LI SER KESÊ GOTIN XWE PÊ RE NAGIRIN**

**Barek gû di nava wî de disekine, lê gotinek nasekine:**
Bi xwe nikare; gotin xwe pê re nagirin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Pêkanînên asîmîlasyonê yên bêsînor



Di vê demê de çanda kurd bi tevahî hêmanên xwe yên maddî û manewî ji sedî sed hatiye înkarkirin û qedexekirin, bi pêkanînên asîmîlasyonê yên bê sînor, xwestine qirkirina çandî temam bikin.**R-4**

## 'Armanca êrişan têkbirina vîn û baweriya gel e'

Hevserokê Konfedraliya Rêxistinên Civaka Demokratîk Cîhad Hesen diyar kir ku armanca hedefgirtina binesaziyên herêmê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve, têkbirina hêvî û îradeya civakê ye û wiha got: "Dagirkeriya Tirk hebûna herêmek demokratîk li kêleka xwe qebûl nake, ji ber wê êrişî herêmê dike."**R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1217 | 30-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# LI HEMBERÎ ÊRIŞÊN DAGIRKERIYÊ YEKRÊZIYA GELAN

Dagirkeriya Tirk bi rêya êrişên xwe yên li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwaze fişarên aborî li ser gel zêdetir bike. Ev êriş li dijî projeya gelan qirkirineke diyar e û piştgiriya ji çeteyên DAIŞ'ê re ye. Tevî ku hedefgirtina binesaziya herêmê û jêderên jiyanê sûcekî dijmirovî ye jî, lê cîhan tev bêdeng e. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê helwesta xwe nîşan dane ku ew ê bi yekîtî û têkoşînê êrişên dagirkeriyê têk bibin.**R-3**



## Hediya Hesen: Zanista Jineolojî cewhera jinê pênase dike




Cîgira Hevserokatiya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hediya Hesen diyar kir ku Zanista Jineolojî bi fikir û şoreşa jinê re dimeşe û desteke dide gihaştina fikrê Neteweya Demokratîk ji civakê re.**R-2**

## 'Li hemberî kuştina zarokan bêdeng nemînin'



Rêveberiya Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafên Zarokan li bajarê Qamişlo Nisrîn Hisên bang li hêzên navnetewî û rêxistinên mafên zarokan kir ku li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker bêdeng nemînin, herwiha daxwaz kir ku erkên xwe bi cih bînin.**R-6**

## Avabûn û xebata Navenda Yekpar a hunerî



**Navenda Yekpar wekî dezgeheke ji destpêka 2021'ê ve heya roja îro mijûldarî xebata hunerî dibe. Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî çalakiyên hunerî dibe, hem jî berheman diafirîne. Di heman demê de nifşekî ji bo parastin û vejandina folklor pê re jî çanda kurdî û hemû pêkhateyan dide amadekirin.R-7**


Li hemberî qirkirina sedsalî ya Tirkiyê çalakiya fedaî — Nehîr pale — R-2


Dewleta Tirk ji bayê guhertinê ditirse — Dilyar Cizîrî — R-4


Dîsa ketin bextê Kurdan — Farûk Sakik — R-5


Êrişên dagirkeran û helwesta Hikûmeta Şamê — Zekî Bedran — R-5


Divê hêmayên planên pêşerojê demokratîk bin — Rohat Bulut — R-6


Nivîsîna bi zimanê serdestan bijartin e lê bişaftin e — Kemal Necim — R-7

# Jinwar wargeha zanistê ye

Ji ber şerê ku li Sûriyê rûda, ji sala 2011`an ve gelê sûriyê gelek êş û azar dîtin, nemaze jina Sûrî ya ku bû qurbaniya şerê ku ev zêdetirî 10 salane berdewam dibe. Gelek jin mafên wan hatin windakirin û barê wê giran bû. Herwiha li aliyekî din jinan roleke pir giring lîstin û tevlî şerê li dijî çeteyên DAIŞ`ê bûn û muhra xwe li dîrokê xistin.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rojavayê Kurdistanê û di hemû cîhanê de şoreşa bi navê jinê deng veda. Di şoreşê de jinên herêmê roleke giring lîstin û tevlî qadên leşkerî, siyasî, civakî û hwd bûn, karîbûn xwe îsbat bikin û bi vîneke mezin, li dijî hovîtiya çeteyên DAIŞ`ê şer kirin û têk birin. Gelek jin bi berxwedaniyeke bêhempa canê xwe fedayî gel û axa xwe kirin. Bi giştî jina kurd bi têkoşîneke mezin di astên bilind û pêşeng de rol lîst û bi xwe re jinên ji pêkhateyên ereb, suriyan û ermen û hwd.. Tevlî van qadan kir. Jina kurd îro di cîhanê de bûye sembola berxwedan û têkoşînê. Bi pêşengtiya jinê gelek saziyên taybet girêdayî jinan, kar û xebatên wan hatin avakirin.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li gundewarê bajarê Dirbêsiyê gundek taybet girêdayî jinan bi navê (JINWAR) di sala 2018`an de hate avakirin. Di nava gunde jinên koçber û yên ji ber îşkenceya malbat an jî hişmendiya mêrê serdest berê xwe dan vî gundî û tê de aramî û ciheke bi ewle ji bona xwe dîtin. Herwiha di nava gunde jin kar û xebatê dikin û zarokên xwe xwedî dikin.

**Avabûna gundê Jinwar**

Ji bo jin û zarokên ku di şoreşê de êş û ziyan dîtin, cih û war ji wan re neman, ji ber vê yekê Kongra Star, jineolojî û hemû saziyên girêdayî jinan li hev kom bûn û pêwîstiyeke mezin dîtin da ku gunedekî taybet ji bo jinan ava bikin û pêwistiyên wan bi cih bînin. Herwiha weke xwestekeke Rêber Abdullah Ocalan bû ku gund an bajarekê taybet ji bo jinan were avakirin. Li ser vî bingehî di sala 2017`an de biryar hate dayîn ku gundekê wiha bê avakirin, cihê gund li gorî guncawbûna wê hate hilbijartin. Bi coşeke mezin bi hezaran jin bûn alîkar ji bo amadekirina vî gundî, di encamê de derdora salekê gund hate avakirin.


Di sala 2017`an de biryara avakirina gund hate dayîn, di salekê de avakirina gund bi dawî bû, di roja tûndiya li ser jinê 28`ê Mijdara 2018`an de gund hate vekirin. Di gunde 30 mal hene, ji wan 20 malbat tê de jin û zarok jiyan dikin. Li gundê Jinwar xwaringehek




mezin heye, Firneya nan, dikan, nexweşxane û Ekademiyek ji bo perwedeyê heye. Dibistana amadeyî ji refa yekê heta şeşê ji bo zarokan heye, hejmara jinan nêzî 50 jinin, lê her demekê hejmar tê guhertin ji ber ku hin nû tên û hin ji gund derdikevin. Jinên ku di gunde jiyan dikin debara xwe bi çandiniyê û xwedîkirina sewalan tînin. Di gund de derman bi destê jinan tê çêkirin, Zeyta bizir El-kitan û Hermel çêdikin, bi cerbandinên xwe çêdikin û karê wan serkeftîye. Di gundê Jinwar de Meclis heye, du rêvebirên meclisê hene û dayik jî endamên meclisê ne, her demekê kombûyînek çêdibe û bi hev re li ser kar û xebatên gund herwiha derbarê mijarên zarokan de nîqaş dikin û bi hevre nêrînên xwe parvedikin. Di gundê Jinwar de jinên ji pêkhateyên kurd, ereb û êzîdî bi hev re jiyan dikin û ji hev fêrî tiştê nû dibin. Wekî din jî ne tenê jinên Rojava an Sûriyê, çi jinên dervî Sûriyê, dikarin li gund jiyan bikin. Jiyana gund bi heskirin, hevgirtin û alîkarî bi hev re tê meşandin. Weke din jî di gunde jin xwe bi xwe parastina xwe dikin. Di gundê Jinwar de mala zarokan hatiye çêkirin, da ku ji bona zarokan di warê çand, huner, stran, dîlan û wênesaziyê de perwerde were dayîn.

# Hediya Hesen: Zanista Jineolojî cewhera jinê pênase dike

**Navenda Nûçeyan**



**Cîgira Hevserokatiya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hediya Hesen diyar kir ku Zanista Jineolojî bi fikir û şoreşa jinê re dimeşe û destekê dide gihaştina fikrê Neteweya Demokratîk ji civakê re.**

Sedsala 21'an serdema azadiya jinan, têkoşîn û şoreşa jinan e. Şoreşa jin bi şoreşa Rojavaye Kurdistanê re hat nasîn. Di şoreşa Rojava de vîna jinê, naskirina jin, zanist li vir wekî gavek ku bi şoreşê ve giredayîye pêşket û deng veda. Bi têkoşîn pêşxistina ked û jiyana jinê wekî şoreş hat bi navkirin û di hûndirê vê şoreşê de bûyerên ku çêbûn an jî pêşketinên ku çêbûn di cîhanê de rista xwekir, derbarê mijarê de Hediya Hesen ji rojnameya me re axivî.

Hediye Şêx Hesen diyar kir ku armanca fêrkirina vê madeyê bi taybet ji jinan re, di çarçoveya naskirina xwe û dîroka xwe de ji bo rasthatina hemû qonaxên jiyanê ye û wiha anî ziman: "Ev zanist destekê dide xurtkirina kesayetiya jinê, jêhatîbûna wê ya bi civakê re zêdetir bibe. Madeya Jineolojiyê di sala yekem a navîn û ya sêyemîn a amadeyî de ji xwendekarên her du zayendan re tê fêrkirin û li zanîngehê şaxek heye ku wê fêrî xwendekarên ku lîse qedandine, dike."

Hediye Şêx Hesen wiha domand: "Mekanîzmayeke heye ku em ji bo amadekirina mamosteyê ku şopandina fêrkirina madeya Jinolojiyê dike her tim qebûl dikin, heye. Ew di akademiyan de kursên perwerdeyê yên pir giran




tê dayîn. Li wir ji aliyê birdozî ve bi kursên perwerdeyê di her warî de tê amadekirin. Ew jî ji bo pisporiyeke zêde derbarê vê madeyê de bidest bixe û mekanîzmeya fêrkirina wê ji xwendekaran re, nas bike. Mamosteyên ku vê madeyê fêr dikin di astên bilind ên perwerdeyê de ne û ev made di hemû cûreyên perwerdeyê de heye."

Hediye Şêx Hesen wiha axafrina xwe bi dawî kir: "Em hêvîdar in ku piştî madeya Jineolojiyayê û mamoste bi awayekî baş werin amadekirin, bandoreke erênî li xwendekar û civakê bike. Ew jî ji bo ku di warê malbatî, civakî û perwerdeyê de were pêkanîn. Ji ber girîngiyeke mezin ji danesîna jinê di vê zanistê de heye. Ew jî ji bo xurtkirina baweriya wê bi kesayeta wê û naskirina cewher û girîngiya rola wê di civakê de. Ev hemû jî ji bo karibe rastiyan di rastiya wê ya civakî û pratîkî de ye, binirxîne."

**Ji Pênûsa Jin**

## Li hemberî qirkirina sedsalî ya Tirkiyê çalakiya fedaî

**Nehîr Pale**

Gerila li hemberî qirkirina Tirkiyê ya ku temenê wê bûye sedsal têdikoşe. 15`ê Sibatê 1925`an dewleta Tirk a dagirker di navbera şev û rojekê de dostaniya gelê Kurd û keda wan a bi salan inkar kir. Dagirkeriyê êdî hebûna civaka Kurd înkar kir, gelê Kurd an wê bibin Tirk an jî wê rastî qirkirinê werin. Hemû serhildanên Kurd ku daxwaza hebûna xwe kirin dawiya wan qirkirin bû û dewleta şerê taybet Tirkiyê heyanî roja îro di polîtîka xwe ya inkar û imhayê de israr dike. Sîstema işkence û qirkirne ya Îmralî rêbazekî dewletê yê herî kirête û ev bûye sedsal ku rêbazên gelekî qirêj li hemberî jin, mêr, zarok û ciwanên Kurd dide meşandin. Ji ber ku gelê Kurd her têdikoşe niha girtîgehên Tirkiyê ji şoreşger, siyasetmedar û têkoşeran tejî bûye.

Ji ber vê yekê ez dibêjim çalakiya 23`ê Cotmehê ya ku li paytexta Tirkiyê Enqere hatî kirin, gelekî pîroz û bi wate ye. Şehîd Asya Elî û Şehîd Rojger Hêlîn berpirsyartiya têkoşînê ya ku ji me hemûyan têxwestin pêk anîn. Li hemberî qirkirina sedsalî bûn xwedî helwest û hebûna gelê Kurd diyar kirin. Gotinên Şêx Seîd û Seyîd Riza û bi sedan mîna wan li erdê nehiştin. Ruhê hemû jinên têne tecawizkirin û kuştin şad kirin, tola hemû şoreşgerên ji aliyê dewletê ve hatin îdamkirin rakirin û bûn dengê hemû mezlûm û bindestan. Şehîd Asya Elî û Şehîd Rojger Hêlîn xeta berxwedanê ya li hemberî qirkirinê berdewam kirin û bersiv dan sîstema işkence û qirkirine ya Îmralî.

Hevala Asya Elî di asta herî bilind de beşdarî têkoşîna jina Kurd a 57 salan bû. Têkoşîna jina Kurd a li hemberî dewleta Tirk ne tenê ji aliyê leşkerî ve, ji hemû aliyan ve tê kirin. Niha li hemû bajarên Tirkiyê rojane jin têne tecawizkirin û kuştin, ev yek jî çavkaniya xwe ji mejiyê dewletê û siyaseta wê digre. Dewletê bi riya polîsên xwe destê xwe avêtin jinên Kurd ên ciwan, ew tecawiz kirin, îradeya wan şikandin û ew anîn rewşa bibin ajanên dewletê û xiyanetê li gelê xwe bikin. Ev jinên ciwan bi destê polîsên Tirkiyê gihîştin rewşa wenda bibin, bikevin bin xizmeta siyaseta qirkirinê û ziyanê bidin gelê xwe. Dewleta Tirk ji gelek aliyan ve êrîşî Tevgera Jin û berxwedana jina Kurd dikin. Niha li girtîgehên Tirkiyê dayîkên temenê wan 70 sal hene, dayîka Emîne Şenyeşar edaletê dixwaze lê belê kesek ji dewletê guh nade çalakiya wê û li xwe mûkir nayên ku bê edaletî kirine.

Bi hezaran gerilayên jin li hemberî siyaseta qirkirine ya dewleta Tirk têkoşiyan û bûn xwedî helwest. Şervanên YPJ`ê di berxwedana Kobanê û berxwedana Serdemê ya Efrîn de bi rihê gerilayên jin li hemberî çeteyên DAIŞ`ê, çeteyên Tirkiyê û dewleta Tirk têkoşiyan. Têkoşîna jin bi rihê berxwedanê yê Şehîd Asya Elî û hemû şehîdên jin vejîn dibe û dighîjê lûtkeyê. Têkoşîna wan berdewam kirin û sîstema baviksalarî têkbirin wê hemû pirsgirêkên jin çareser bike. Jina Kurd li kûderê be, pêdivî heye ku xwe birêxistin bike û têbikoş e.



# Avabûn û xebata Navenda Yekpar a hunerî

Navenda Yekpar wekî dezgeheke ji destpêka 2021'ê ve heya roja îro mijûldarî xebata hunerî dibe. Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî çalakiyên hunerî dibe, hem jî berheman diafirîne. Di heman demê de nifşekî ji bo parastin û vejandina folklor pê re jî çanda kurdî û hemû pêkhateyan dide amadekirin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Koma Yekpar di 8'ê Gulana 2021'ê de bi saya 3 ciwanên dildar ji bajarên cuda yên kantona Cizîrê hate damezrandin. Armanca wê komê vejandina kelepûr û çanda pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, lêgerîna berfireh li stranên kevneşopî û çîrokên kevnar, hem jî belgekirina wan. Ev yek jî bi çêkirina belgefîlm û klîbên bi riya xebata cûrbecûr di nav komên ciwan ên di nav vê navenda Yekpar de. Bi avêtina gava yekem re, ti kom bi navê Yekpar tune bû, lê belê di encama nûjenkirina du berhemên folklorî de ku bi derfetên kêm amade bûn, ev kom ji aliyê sê kesan ve hat avakirin. Di wê demê de endamên komê 8 kes bûn û dest bi perwerdeyê kirin.

**Veguherîna komê ber bi navendê ve**

Koma Yekpar piştî demeke dirêj ji avabûnê di encama perwerdeya hunerî de konserta xwe ya yekem bi navê Melodiyên Payîzê li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê li dar xist. Tê de 9 stran bi zimanê kurdî(kurmancî, zazakî û soranî), erebî û suryanî stran hatin gotin. Beriya wê ev kar li malan dihatin kirin, lê piştî ku derfet çêbû, ev kom di 11'ê Tîrmeha 2023'an de veguherî navendeke hunerî. Ev yek jî piştî xelatkirina koma Yekpar ji hêla ya bi navê Cross Generation Media ve ku navend hat vekirin. Ew rêxistineke Elmanî bû di wê demê de projeya wê ew bû ku belgefîlmekê li ser 8 hunermendên jin ên Kurdistanê çêbike. Di nav



wan de endama koma Yekpar, hunermend Sîdar Îbrahîm bû. Êdî têkilî di navbera wê rêxistinê û komê de çêbûn, di encamê de jî xebata hunerî hat kirin.

**Destpêkirina xebata hunerî ya meydanî**

Kom Yekpar, yekem car beşdarî duyemîn festîvala Orkêş ya muzîk û stranê bû. Festîval li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû, li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya bajarê Qamişlo di 15'ê Gulana 2023'an de hate lidarxistin. Di festîvalê de koma Yekpar 3 stran pêşkêşkirin, 2 ji wan folklorî bûn 'strana Xerîb Bilbil ya hunermend Soska Samo û strana De lolo ya hunermend Şakiro', ya sêyem strana Keça Hûrî bû gotinên wê yên Beşîr Mele û awazên Sîdar Îbrahîm bûn. Piştre jî Navenda Yekpar gelek xebat, konsert, şahî, pêşangeh li dar xist. Her wiha Navenda Yekpar konserta xwe ya bi navê Melodiyên Payîzê ya 2'an Li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê li dar xist. Piştre jî di 5'ê Pûşbera îsal de konserta Şahê Dengbêjan 'Şakiro' li Navenda Mihemed Şêxo ji aliyê Yekpar ve hat lidarxistin. Herî dawî Navenda Yekpar di 28'ê Îlûnê de li Navenda Mala Me ya zarokan şahiyek li dar xist. Tê de şano, muzîk û stran hatin pêşkêşkirin. Di dema pêş de jî wê Navenda Yekpar festîvalekê bi navê Melodiyên Payîzê ya 3'yan li ser asta 4 rojan li Qamişlo li dar bixe. Wê di festîvalê de stran, şano û pêşangehên wêneyan werin pêşkêşkirin. Li gorî ku rêveberiya Navenda Yekpar Beyar Dîno, ji rojnameya me re eşkere kir, hat zanîn ku wê di dema pêş de Navenda Yekpar, konsertên hunerî li Başûrê Kurdistanê li dar bixe. Li aliyekî din gelek projeyên hunerî, weke şano, wênesazî, kurtefîlm û hwd… ji bo zarokan bi taybet, hem ji bo jinan bi berfirehî li gel Navenda Yekpar di dema pêş de hene.

**Beşên navendê**

Navenda Yekpar hin beş û koman digire nava xwe, weke koma muzîkê. Ev kom klîb, stran û çalakiyan çêdike. Li nik wê jî koma sînemayê heye, beşa şano, senaryo, wênekêşî, montaj û çêkirina kurtefîlm û belgefîlman dihewîne nava xwe. Her wiha koma wênesaziyê ji du beşan pêk tê. Beşa yekem ji hînkirina xêzkirinê ya gav bi gav pêk tê. Beşa duyemîn jî ji bo lidarxistina pêşangehên xêzkirinê yên komî û takekesî xebat dike. Beşa taybet a zarokan jî heye xebata di vê beşê de di warê çêkirina şahiyên hunerî ji bo zarokên ku temenê cihêreng e. Armanc ew e ku piştgiriya derûnî li gel zarokan bi giştî were avakirin. Bi taybet zarokên nexweş weke nexweşên ku penceşêr bi wan re heye û zarokên sêwî, hem jî yên xwedî pêdiviyên taybet. Navenda Yekpar beşa jinan jî hildigire nava xwe, armanc ew e ku piştgirî û bihêzkirina jinan di warê hunerî û çandî de were çêkirin. Li gel van beşan jî, beşên din ên rêvebirina kar û barên cuda hene. Hejmara kesên ku cihê xwe weke endam di Navenda Yekpar de digirin bêhtirî 30 ye, hin ji wan mamosteyên hunerî yên bispor in û yên din jî rêbever û hwd… in.

**Perwerdekirin û xebata navendê**

Navenda Yekpar tenê li Qamişlo, taxa Xerbî ye, lê xebata hunerî ne sînordar e, ew bêhtirî xwe şevbuhêrk, çalakî, şahî û fastîvalan li Qamişlo û kantona Cizîrê li dar dixe û tevlî çalakiyan dibe. Di heman demê de li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî xebata hunerî dike. Li kêleka xebatê jî, di navendê de perwerdeyên cûrbecûr weke ya muzîkê di nav re tembûr, keman, bilûr, piyano, şano, fotografî, dîmen, wênesaziyê dide zarokên biçûk û yên temen mezin. Di heftiyê de du rojan perwerde ji bo hemû beşan tên dayîn, niha jî nêzî 30 kes perwerdê dibînin. Li aliyekî din jî bi awayekî heftane fîlm li navendê tên pêşandan. Li gorî Beyar Dîno da diyarkiririn, ji destpêka avabûna komê ve hetanî Tîrmeha sala bûrî perwerede bêpere bûn. Lê ji destpêka Tîrmeha sala 2023'an û bi şûn de buhayê perwerdeyê ya mehane 10 dolar in. Beyar da zanîn ku armanc ne pere ne lê belê parastin û nûjenkirina çand û folklorê ye, her wiha pêşxistina ciwanan e. Hêjayî bibîrxstinê ye ku ev navend serbixwe ye, xwe bi xwe bi rê ve dibe.

# Aslîka Qadir: Dengê qedîm ya Erîwanê

**Navenda Nûçeyan**

Aslîka Qadir yek ji dengbejên jin ên Radyoya Erîwanê ye ku zimanê Kurdî pê re herikî jiyanê û bû mêvana her malekî. Aslîka Qadir a ji eşîra Sîpîkan a ji Mûsilê koçber bûye ye, di sala 1945'an de li gundê Elegez a Ermenistanê di nav malbatekê Êzidî de hat dinê. Aslîka Qadir rûxmê hemû zextên civakî û destpêkê qedexeyên Sovyetan û paşê jî zext û qedexeyên hikûmeta Ermenisyanê bi salan bi dengê xwe yê bihêz rih da stranên Kurdî. Aslîka tevî temenê xwe yê mezin hîna jî xwendina xwe ya li ser ziman û muzîka Kurdî didomîne. Strana 'Welatê me Kurdistanê' ya ku di sala 1964'an de tomar kiriye, weke newayek ku bi hêza welatparêziya hunermendekî jin welatê wê bi awayek herî bedew tê qal kirin bi salan e dev bi dev tê gotin û nûjeniya xwe diparêze.

Çawa piştî hilweşana Yekîtiya Sovyetê li Ermenistanê nijadperestan serî hildan û xwestin bi şikênandina ronakbîrên Kurd, ku yekîtiya miletê Kurd diparastin, dutîretiyê bixin nava olka Kurdên Ermenistanê ser bingeha cihêtiya olê Aslîka Qadir wek mêrekî çarquçikî piştgiriya hogirên xwe-ronakbîran kir û rê neda, ku pirtûkên fêran wek yê bi navê "Zimanê êzdîkî" bên weşandinê. Aslîka Qadir mecbûr ma dawiya salên 90'î ji Ermenistanê derdikeve û li welatekî Ewropayê bi cî bibe.


Pirtûka bi navê "Hunerkom Akademî Mîr 1978-2006" (Firaz Baran - Weşanên Mezopotamya) de kurtejiyana Aslîka Qadir wiha hatiye nivîsandin: "Malbata wê bi eslê xwe ji Qersê ye. Di sala 1963'an de derbasî Radyoya Êrîvanê bû. Li vir 6 sal ked da. Hunermend li radyoyê bername nivîsandin, beşa wêje û helbestê xebat meşandin. Dîsa di radyoyê de 25 stran gotin. Jiyana Aslîka Qadir ji bilî hunerê jî renga reng e. Wê di sala 1968'an de li zanîngeha Êrîvanê beşa Zanistiyên Rojhilat qedand. Piştî wê 15 salan li dibistanên amadekariyê li ser wêje û zimanê Ermenî ders dan. Hunermend li Wezareta Karê Perwerdeyê ya Ermenistanê 5 salan xebitî û mamosta perwerdekirin.

Aslîka Qadir ji bilî Kurdî zimanê Rusî, Ermenî, Farisî, Darî û Almanî dizane. Dîsa di wêje û zimanê farisî de jî pispor e. Ji ber ku gelek zimanan dizane, di sala 1980'î de, di dema şerê Efxanistanê de çû wir. Li Efxanistanê nivîsên bi Rusî wergerand Darî û Farsî. Aslîka Qadir di 29 mîn Kongreya Partiya Komûnîst a Ermenistanê de ji bo



endametiya Parlamena Ermenistanê hat hilbijartin. Parlementeriya wê 2 salan dewam kir û dema Sovyet rûxiya dev jê berda. Aslîka Qadir di sala 1982an de zilamê xwe winda kir. 2 zarokên wê yên bi navê Armanc û Sitella hene. Albûma Aslîka Qadir "Qasimo" di nav weşanên Akademiya Çand û Hunerên Kurdî de derket."

**Têbînî**



## Nivîsîna bi zimanê serdestan bijartin e lê bişaftin e

**Kemal Necim**

Berê mijara nasnameya deqa wêjeyî û pirsa; gelo wêjeya ku dahênerên kurd bi zimanê serdestan dinivîsin dikeve rêza wêjeya Kurdî lê na? Bûbû mijara vê quncikê. Lê van du hefteyên derbasbûyî dîse ev mijar ji hêla pir nivîskar û wêjevanan ve hate gotûbêjkirin, bi taybet nivîskarên ku bi zimanê Erebî dinivîsin bi gelek gotar û lêkolînan hewil didin ku bi awayekî ji awayan berhem û danînên xwe weke berhemên wêjeya Kurdî bidin nasîn. Hin ji wan nivîskaran xwe avêtin tor û bextê rojnameyên Erebî yên naskirî û ev boçûna xwe li wir belav kirin.

Tişta balkêş ew ku dahêner û nivîskarên Kurd bi dehên salan bi zimanê netewên serdest nivîsîn, ji wan nivîskarên bi nav û deng derketin çi bi zimanê Erebî û çi bi zimanên Tirkî û Farisî, lê di pêvajoya dehên salan de mijara ka ev wêje û deq û dahênan dikeve rêza wêjeya kurdî de lê na, nehatibû gotûbêjkirin. Berovajî wê dahênana bi zimanê serdestan bûbû cihê şanazî û serbilindiyê. Lê wilo xuyaye ku di van deh salên dawiyê de rewş hinekî hatiye guhertin, bi taybet ji bo kurdên Rojava yên ku bi zimanê erebî dinivîsin. Piştî ku rewşa qedexe û bişaftinê li Rojava li ser çand û zimanê kurdî rabû, bi dehan nivîskaran êdî dest bi nivîsîna bi zimanê Kurdî kirin, pêre jî êdî ev pirsa aloz berz bû, ango pirsa nasnameya wêjeya ku kurd bi zimanê serdestan dinivîsin.

Boçûna ku piraniya nivîskaran li ser lihev kirine û ya rast jî ew e, nasnameya deq û nivîs û berheman ew zimanê ku pê hatiye nivîsîn e. Ji bilî wilo her çiqas naverok û mijara nivîsê û berhemê kurdî be yan nivîskarê wê Kurd be jî, lê bi zimanekî din hatiye nivîsîn ew dikeve rêza berhemên bi wî zimanî û yên wê nîjad û netewê.

Her çiqas ev boçûn û nêrîn gur û berz dibe, aliyên din ku bi zimanê serdestan dinivîsin, li şûna ku li xwe mukir bên, hewil didin bi hin derbirîn û hevokên mezin û şêlo bêjin ku ji ber ew kurd in û naveroka nivîsên wan kurdî ye, lewma ew wêjeya kurdî dinvîsin. Her çiqas ev mafekî wan e ku hewil bidin nêrîna xwe bêjin û biparêzin, lê wexta nivîsîna bi zimanê serdestan weke azadiyekê û mafekî rewa û bijareyekê bidin nîşandan, ev dibê xwexapandin.

Nivîkarekî rojavayî ku bi Erebî dinivîse berî hefteykê di rojnameyeke Erebî ya bi nav û deng de gotarek derbarê mijarê nivîsî, di gotara xwe de pir caran peyva azadiya nivîsê û hilbijartina ziman dubere kiriye. Ango xwestiye bêje ku yê nivîskar azad e ku bi çi zimanî binivîse û kîjan zimanî hilbijêre.

Ji xwe ev boçûn bi giştî rast e, lê ne di rewşa kurdan de. Yek nivîskarê kurd, di nav wan de xwediyê gotarê jî, bi azadî ji xwe re nivîsîna bi zimanê Erebî nehilbijartiye, lê belê bi darê zorê li ser hatiye ferzkirin, ew ferzkirin jî di çarçoveya polîtîkayên demdirêj û bişaftinê de hatiye kirin, lewma dema ku îro yekî nivîskar ji me re bêje wî bi azadî ji xwe re nivîsîna bi zimanê Erebî hilbijartiye, ew ji xwe re bi me dikene, bi xwe dikene û dibe hevkarê kiryarên bişaftina çandî.

# ‘Li hemberî kuştina zarokan bêdeng nemînin’

Rêveberiya Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafên Zarokan li bajarê Qamişlo Nisrîn Hisên bang li hêzên navnetewî û rêxistinên mafên zarokan kir ku li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker bêdeng nemînin, herwiha daxwaz kir ku erkên xwe bi cih bînin.

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên hovane li dijî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dike, ji sûcên dijmirovî yên rojane têr nabe, ku herêmên tijî sivîl û zarok dike hedefa balafirên xwe. Di van êrîşan de gelek sivîl birîndar dibin piraniya wan zarokin dibin qurbaniya şer. Li hemberî van sûcên dijmirovî ku zarokên herêmê yên bê guneh dibin armanca balafirên dewleta Tirk a dagirker rêxistinên navdewletî û rêxistinên mafên miorvan bêdeng mane. Mirov matmayî dimîne yên ku banga parastina mafên zarokan dikin li pêşiya van êrîşên hovane dûrî exlaq û mirovahiyê bêdengin. Di rojên dawî de, dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe li dijî herêmê zêde kiriye, bi taybet aliyên Eyn îsa, Minbic û li herêma Şehbayê ku piştî dagirkina Efrînê, şênî neçar man berê xwe bidin Şebahyê, lê dewleta Tirk rojane vê herêmê bombebaran dike, ku êşên koçberan zêde dike û jiyana wan zehmetir dike.

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê di 10 Cotmehê de gundê Tehna yê li rojavayê kantona Minbicê topbaran kiribû. Di encama êrişê de zarokên birayên hev Ebdo Cuma El Casim ê 5 salî û Casim Cuma El Casim ê 9 salî şehîd bûn.

Casim Mehmûd El Casim ê 6 salî, Ehmed Casim El Casim ê 8 salî û Muslim Casim El Casim ê 10 salî jî birîndar bûn. Zarokên birîndar rakiribûn Nexweşxaneya Firatê ya Kobanê.

Derbarê vê mijarê de Rêvebriya Rêxistina Stêrk a Şopandina Mafên Zarokan Nisrîn Hisên diyar kir ku hedefgirtina zarokan ji aliyê dagirkeriya Tirk ve berdewam e û wiha got: “Di van rojên dawî de artêşa Tirk a dagirker gundê Tehna yê girêdayî kantona Minbicê kir armanca balafirên xwe, di encama wê de du zarok şehîd ketin û sê birîndar bûn. Her roj herêma me li hemberî teqîn û bombebarana balafirên tirk tê, biçûk û mezin dibin hedefa van êrîşan.”

Nisrîn Hisên wiha domand: “Ev bûyer û bûyerên din yên kuştinê bandoreke neynî li ser tenduristiya (derûnî û pîskolojîk) ya zarokan dike, di aqil û mêjiyên wan wêne dimînin, ji ber ku her roj ev bûyer dûbare dibin, dibe ku ev yek berovajî bike ser jiyana wan di pêşerojê de.”



Nisrîn Hisên daxwaz kir ku şer û pevçûn, topbarankirina li ser herêmê ji hêla artêşa tirk a dagiker bi dawî bibe û wiha pê de çû: “Li gorî zagonên rêxistinên mafên mirovan hedefgirtina zarokan sûcekî şere, lê îro em dibînin ku li hemberî hedefgirtina zarokan tevahiya saziyên navneteweyî bêdeng in.”

Nisrîn Hisên di dawî de bang li raya giştî, rêxistinên mafên zarokan û hêzên navdewletî kir ku li hember êrîşên dewleta tirk a dagiker bêdeng nemînin û wiha got: “Divê rêxistinên parastina mafê mirovan û bi taybet rêxistinê ku bi mafê zarokan re eleqedarin bi erkê xwe yê mirovî rabin.”

# Li hemberî şoreşê...polîtîkaya destavêtina hişmendiyê

**Zana Roj/ Şehba**

**Li hember hemû cûreyên şerê taybet û siyasetên ku ji aliyê dijmin ve li ser mirovahiyê têne pêkanîn. Li herêma Şehbayê pêngava “Na Ji Madeyên Hişbir re” bi silogana “Baldarbin ji madeyên hişbir yên ku xerabî û nexweşiyê belav dikin, dest bi dest ber bi civakeke bê nexweşî” hate destpêkirin.**

Bi pêşengtiya Ofîsa Jin ya Desteya Tenduristiyê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya Jin û Yekîtiya Jinên Ciwan li Kantona Efrîn û Şehbayê Pêngava `Na Ji Madeyên Hişbir re` hate destpêkirin. Ev pêngav li ser asta hemû herêmê hate berdan û di vê çarçoveyê de gelek çalakî ji aliyê her sê aliyên têkildar ve hatin orgenîzekirin.

Têkildarî vê pêngavê endama Ofîsa Jin ya Desteya Tenduristiyê Gulê Cafer û Berdevka Yekîtiya Jinên Ciwan Zeyneb Ebdo li Kantona Efrîn û Şehbayê ji rojnameya me re axivîn.

**`Ji bo têkbirina vê şoreşê, destwerdanên bi siyasetên zirav`**

Gulê pêwîstiya berdana vê pêngavê di giştî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de diyar kir û wiha got: “Hêzên faşîst yên ku rojane li hember têkbirina îradeya gelê Kurd rojane bi pilan û siyasetên nû tavahî Kurdan li çar perçeyên Kurdistanê digrin hedef. Bi taybet di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de û bi serkeftina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re, gelek destwerdan bi siyasetên zirav li ser gel û ciwanên vî welatî hatin kirin.



Gulê Cafer

Gelê birêxistinkirî û xwedî helwest ku dikare li hember tavahî cîhanê serî rake, bê guman metirsiyeke li ser hêzên faşîst û dijminê gelê Kurd bi taybet.

Li ser van bingehan her çiqas destkeftî û serkeftinên vê gelî bêne mezinkirin, li beramber wê yekser siyasetên qirkirin û tunekirinê têne meşandin. belavkirina madeyên hişbir jî yek ji rêbazên herî zirav yên şerê taybet ku dikare civakê bi aramî û ji hundir ve bide têkbirin e. Bi naskirin û têgihîştina siyasetên dijmin re, helber li hember vê yekê ketina ferqa van siyasetan jî heye. Ji lewra di asta giştî Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ev pêngav hate berdan û çalakiyên hişyarî û têgihştina zirarên van madeyan li hemû herêman hatin birêxistin kirin.”

**Stratejiya hegemoniyê hedefgirtina hêza ciwana ye**

Her wiha Gulê bal kişand ser girîngiya pêngavê û siyaseta ku li ser ciwan û gelê Efrînê li herêma Şehbayê tê meşandin û wiha pê de çû: “Li ser gelê koçber bi taybet siyasetên pûçkirin û hedefgirtina îradeyê zêdetir tê birêxistin kirin. bê guman ev yek di herêma Şehbayê de ya ku nêzî 7 salî ye gelê Efrînê tê de jiyan dike;



Zêneb Ebdo

hate dîtin. Li kêlek ewqas hedefgirtin û êrîşên ku ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve têne kirin her wiha siyaseta dorpêçê ya Hikumeta Şamê li ser herêmê tê ferizkirin. Di encama negirtina tu encaman ji van siyasetan, Destwerdanên bi rêbazên nerimtir û ziravtir têne kirin. Bi taybet li hermber ciwanan ev yek gelek tê bikar anîn. Di stratejiya dijmin û ya cîhanê de ev yek diyarker e, ji bo hilweşandina civakekê yekser destavêtina hêza ciwanan kirin e. Lê bêguman ciwanên herêmê bi rêxistinkirina wan di zanabûn û ferqa van siyasetan de ne. ji lewra xweparastin ji van siyasetan bi her awayî tê dîtin.”

**Kampanyayên hişyariyê**

Gulê di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: “Li hember tavahî siyaset û cureyên Şerê Taybet ya ku li ser gelê Herêmê û ciwanan tê meşandin, me xwest bi Jinên Ciwan û Hêzên Ewlekariyê re bibin yek û dest bi vê pêngavê bikin. Di vê çarçoveyê de kampanyayên hişyariyê bi riya belavkirina biroşûran li ser gel, belavkirina filîksan di navçeyan de her wiha rêxistinkirina semînerên têkildarî bandora van medeyan li ser tenduristiya mirov û hwd hatin dayîn.”

**`Wê ciwanên Apoyî rê ji pilanên dijmin re ve neke`**

Her wiha berdevka Yekîtiya Jinên Ciwan Zeyneb Ebdo xuya kir ku wê li hember tavahî cureyên şerê taybet bibin hêza têkbirinê û wiha got: “Li ser hêza ciwantiyê û rihê ku di nava ciwan û jinên ciwan yên Apoyî de hatiye avakirin, gele lîstikên dijminê gelê Kurd li çar perçeyên Kurdistanê têne birêvebirin. ji bo avakirin û gihandina ciwanekî vala û bê helwest her çi ji destê wan bê tê kirin. Ev yek di herêmê de me dît û em dibin şahid çawa ku dixwazin bi riya belavkirina şerê taybet bi gelek rê û rêbzan dikin. Weke Rêxistina Tevgera Ciwanên Şoreşger û Yekîtiya Jinên Ciwan di vê alî de xebatên îdeolojîk û piratîkî hatin kirin. Bi taybet di herêma Şehbayê de, di mercên jiyanê yên heyî de dijmin dixwaze valabûna herêmê ji ciwanan him di aliyê hişmendî û koçberkirinê de bide avakirin.

Helbet li beramber hemû lîstik û şerên zirav ku têne berdewam kirin, em xwedî rol û misyon in ku bibin hêza têkbirin û valaderxistina siyasetên dijmin in. Di vê oxirê de em bi çalakiyên xwe û tevlîbûnên me ji van xebatan re, em di wê lêgerînê de ne ku çawa dikarin ciwanan hişyar bikin û li beramber van siyasetan serwext bin. Bê guman ciwantiya ku li ser hîmên bîrdoziya Rêber APO mezin û perwerde bûne û dibin, wê hemû pilanên hêz û aliyên ku dixwazin enerjî û hêza herikîna ciwanan hedefbigrin bisekirin. Di vê şoreşê de hêza ciwanên Apoyî pêşengtî kirin û xwe îsbat kirin, ji lewra wê rê ji van pilanan re neyê vekirin.”

## Xwenasîn



### Divê hêmayên planên pêşerojê demokratîk bin

**Rohat Bulut**

Bê guman mirov li ser pêşeroja xwe tiştekî nikikare bike. Angu guherînekê tê de bike. Lê belê mirov dikare pêşeroja xwe ava bike. Ev jî ji bo mirov û civakan gelekî girîng e. Lê pêşerojeke çawa? Li ser heman kevneşopiyê yan jî li gorî hewcadariyê demê û li gorî himbêzkirina her ferdê civakê be? Bê guman her plan û projeyên ku dê bê pêşxistin pêwîste li gorî daxwaz û berjewendiyên civakê be. Heke civak bi tecrubeyên paşerojê ji nû ve avabûnekê saz bike pêwîste ev li ser bingeheke civakî û demokratîk be. Bi taybetî di pêvajoya niştecihbûn û bajarvaniyê de plansaziya ku pêvajoyê kontrol bike û rêve bibe, pêdiviyek neçarî ye. Divê di pêvajoyeke plansaziya demokratîk de ku rêxistin û sendîkayên pîşeyî jî tê de cih bigirin, plansaziyên pêşketina herêmî û bajarî bêne çêkirin. Bi vî rengî, li gorî hewcedariyên ku di ronahiya biryarên aborî, civakî-çandî, hawîrdor û jeolojîk de hatine destnîşankirin, pêşerojek bajarî dê were afirandin.

Di heman demê de, bilindkirina standarda jiyanê li herêm û bajarên ku koçberanî girtine û diyarkirina sîyaseta geşepêdana bajarî û niştecihbûnê ya giştî di nav karên pêşîn de ne. Jiyana heyî û ya ku ji nû ve li ser bingeha demokraîk pêş bikeve pêwîs e hemû daxwazên civakî bi cih bîn e. Di serdemeke wiha de ya herî zê li ser were sekinîn jî divê ev be.

Bi taybetî jî rêveberiyên herêmî li ser vê bingehê dema xebatên girîng bike û berjewendiyên civakî esas bigire dê rewşeke berbiçav a guherînên bingehîn xwe bide xuyakirin. Ev bi pêşxistina guherîna hişmendî mayînde dibe û çareseriyê ava dike. Ji perwerdeyê bigire, heta hemû kar û barên ku dê ji bo civakê bê kirin divê bi hişmendiyeke wekhev û demokratîk pêş bikev e.

Ji demokrasî û wekheviyê xweştir û baştir tiştek tune ye. Pêwistiya herî mezin a civakê jî bi vê yekê ve heye. Lewre jî her kar û xebat divê li ser demokrasiyê teşe bigire. Pêşerojeke demokratî dê azad û wekhev be. Naxwe dê ji şer, pevçûn, alozî û nakokiyan wêdetir nebe. Ji bo pêşerojeke azad jî rist û berpirsyarî ya rêveberiyên herêmî û siyasetmedaran e.

Ev rewş ji bo gundan, bajarok, navçe û bajaran bi giştî derbastdar e. Ji xebatên çand û hunerî bigir e heta yên xizmetê ya girîng bi hişmendiyeke demokratîk be. Bi plan û projeyan, bi nêrîn û perspektîfên azad ev pêşeroj bê teşegirtin. Teşegirtina pêşerojeke civakî ya li ser hîmên demokrasiyê dê bi civakê bide qezenckirin. Pêşeroj dê bi van hêmayan misoger bibe.

Heke hêmayê vê yekê nebe jî dê civak ji rewşa kaotîk a bi aloz rizgar nebe. Ji lewre jî mirov dê nikaribe behsa pêşerojeke azad jî bike. Lewma jî ji her demê zêdetir pêwistiya me bi wekhevî, azadî û domokrasiyê heye. Divê hêmayên planên pêşerojê demokratîk be ku azadiya civakê misoger bibe.



# ‘Bila her kes ji xwe re li israr û serkeftinên me temaşe bike’

Hervserokê Partiya Yekîtiya Demokiratîk PYD`e Xerîb Hiso diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker tepkî li hemberî îradeya gelê kurd daniye, her dixwaze gelê kurd qir bike û vîna wan lawiz bike û wiha got: “Cihên ku civak pêdiviyên xwe yên jiyana jê digre wir bobabaran dike, her dixwaze ev jiyana ku civak xwe bi xwe rêve dibe, rawistîne û qir bike.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker, ji êvara roja 23’ê Cotmehê ve êrîşî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike. Heta niha gelek navendên xizmetguzariyê yên wekî îstasyona gazê, ceryan, embarên dexl û danî, navendeke tenduristiyê ya Qamişloyê û navendên Asayîşê hatine bombebarankirin. Her wiha îstasyona ceryanê ya li Kobanê, bîrên petrolê yên li Tirbespiyê, firneyên Kobanê û Amûdê bi balfirên bêmirov bombebaran kirin. Di vê çarçoveyê de Rojnemeya me hevpeyvînek bi hervserokê Partiya Yekîtiya Demokiratîk PYD`e Xerîb Hiso re pêk anî û hepeyvîn wiha bû:

**Armanca êrişên dewleta Tirk a dagirker çi ye?**

Armanc dewleta Tirk a dagirker ji van êrişên dawî, ew e ku berdewamkirina armancêm berê ne, dagirkeriya Tirk her bi êrişên xwe yê bêmirovî li herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê dewam dike û heya niha nehatiya rawistandin. Ji ber ku dewleta Tirk a dagirker roja bi teknîka xwe a bêmirovî êriş neke, her wiha êrişên xwe bi gefxwerina siyasî dewam dike, ew gef jî li dijî hebûn û îradeya me tê kirin, bi tayibet li dijî gelê Rojavayê Kurdistanê pêk tîne. Rojekê ezmanên herêma me bê keşif û belafir nema ne, her roj wê pênesaziya herêmê û kesên ku têde dijîn, dike armanc. Ev êrişên ku di 23`ê Cotmehê de hatine destpêkirin, ne kêmtire ji êrişên beriya niha, dewleta Tirk a dagirker dixwaze îradeya gelê kurd tune bike, ji ber ku ev êriş di çarçoveya qirkirina gelê kurd de destpêkiriye. Li ser vê bingihê êrişên xwe bê navber li ser Rojavayê Kudistanê, Başûrê Kurdistan û Bakurê Kurdistanê didomîne, her dem diwaze îradeya kurdan lawaz bike, kesên ku pêşengiya civaka xwe û Buhare Gelan dike ew dibe armanc û tê şehîd xistin. Her wiha ev pêşengiya ku di nava civakê de tê kirin, ew jî bi pêşengiya jinê ye. Lewma tirsa dewleta Tirk a dagirker çêdibe û ne rehtî li cem dewleta Tirk û hukûmeta Şamê tê avakirin. Her dem wekî pirs di serê me de tê avakirin çima dewleta Tirk a dagirker êrişî Bakur û Rojhilatê Suriyê dike û Hukûmeta Şamê xwe bê deng dike?. Şer û şoreşa me ne beramberî tirkiyê ye ne jî beramber destheledariyê ye, şoreşa me ew e ku civak bi ser xwe ve were û li çand, dîrok û nirxê xwe vegere ku bikaribe bi awayekî rast xwe bi rêve bibe û bi rêzî li hev mêze bikin. Di heman demê de kîn û nefret di nava civakê de tune bibe, armanca me ji vê şoreşê ew e ku civakeke demokiratîk û azad were afreandin.

Dewletên destheledar di serî de dewleta Tirk a dagirker ev pêşketinê wiha li dijî destheledarî, zehiniyeta şer û komkujiya xwe dibînin, ji ber vê yekê tepkî li hemberî îradeya gelê kurd daniye, dewleta Tirk a dagirker her diwaze jiyana kurdan bike dojeh û wan bê îrade bihêle. Cihên ku civak jê pêdiviyên



jiyana xwe digrin, wir bobabaran dike, mîna cihê petrol, nexweşxana, stasiyonên avê, saziyan û febirîqeyên xwarinê û hwd…, her dixwaze ev jiyana ku civak xwe bi xwe rêve dibe rawistîne û qir bike. Di heman wextî de dixwaze gel bide koçberkirin. Her wiha di roja me ya îro de ev dewletên nejedparest têk diçin, ne li hemberî qaptalîzimê têk diçin ji ber ku qaptalîzim wan diparêze, lê têk çûne wan wê beramberî pêlên gelen be. Niha em di şerê cîhanê yê 3`mîn de ne ku li ser axa Kurdistanê ev şer hat destpêkirin, heger ev civakên navdewletî bi rastî navnetewî ban, wê pirsgirêk hatibe çareserkirin. Lê ji ber ku ne netewî ne ew nejedparestin ku tenê şer, kumujî, getilkirin û helandina civakê dizanin û nikarîbûn pirsgirêka kurdan bidin çareserkirin ku êdî ev pirsgirêk bû pirsgirêkek cihanî û berfereh, ji ber vê yekê şer gihîşte astekî ku bibe şerê cîhanê yê 3`emîn.

Em dibînin ku şerê di navbera Îsrail, Hemas û Hizib-Ellah de hatiye qewmandin û her roj berferehtir dibe, her kes hisabê vî şerî dike, gelo çima ti kes hisabê van êrişên dewleta Tirk a dagirker nake ku çima êriş dike?, ev jî xeteriyekî pir mezin bi xwe re tîne û niha Tirkiya yê tengaziyek pir mezin jiyan dike, pêwîstiyê Tirkiyê gewrandinên pir mezin heye, pêwîste gewrandinekî erînî bide çêkirin ku aşîtiyê asas bigir. Bê guman di dîrokê de hatiye gotin ku Tirkiyê ti carî zemînên erînî di xwe de ava nekiriye, hegir avakiribe jî di heman wextî de xirakiriye, demkî tektîkin. Ji ber vê yekê niha dewleta Tirk a dagirker di hemû aliyan de hatiye fetisandin, aliyê aborî, siyasê, civakî, dibilomasî û hete di aliyê leşkerî de hatiye fetsandin û derbeyên pir mezin dixwe. Dema ku dewlet Tirk were fetsandin û helweşandin, wê civak jî li hemberî wî rabe û wî nefret bike, êdî civaka Tirkiyê bê bawere û hevî me ne, ji ber sûc û kiriyarên bêmirovî ku dewleta Tirk a dagirker dide meşandin li ser zarokan û jiyana civakê. Ji ber vê yekê dewleta Tirk a dagirker nikarê di hundirê Tirkiyê de çareser bike, êdî êrişê derve dike û dixwaze civaka xwe bide îqnakirin ku ew bidijminin. Em dibêjin ku her çi bibe bila bibe îradeya gelê kurd roj bi roj mezintir û xurtir dibe, em hazirin ku çi were pêşiya me, ji ber ku îradeya me ji her tiştî mezintire.



**Çima civaka navdewletî li hemberî sûcên ku dewleta tirk a dagirker pêk tîne, bê denge?**

Ji bo civaka Navdeletî pirsek girîng û cidî ye, her dem ev pirs di serê me de tê avakirin ku çima civaka Navdewletî li hemberî van êrişan xwe bê deng dike?, Civaka Navnetewî tenê li hemberî me bêdenga, ji ber ku di gelek dewletan de şer û alozî hat destpêkirin û heya roja îro jî ev dewame, lê dewletên Navnetewî ji bo van dewletên din ne bêdenge û mudexele dike. Ev jî tê xuyakirin ku edelet li cem Civaka Navnetewî tune ye, eger rastî edelet û qanûn li cem wan hebe, em rojana di nava çar welatan de tê qirkirin, hedefgirtin û bombebaran kirin, wê demê ka edelet û qanûna mirovahiyê li kur ma!. Mixabin dewletek jî piştgirya kurdan nake. Her wiha em dibînin ku dema dewletek pişgirya kudan bike û bêjin ku mafê kurdan heya, ew dewlet tê rexinekirin. Niha ku dewleta Îranê êrişî kudan bike wê dîsa her kes xwe kor û lal bike. Mîneka herî ber biçav şerê Filistîne ku hemû dewlet ji bo alîkarî û piştgiriya wan tevdigere û çarewseriyê dixwaze peyide bike, di heman demê de ev dewlet piştgiriya Îsraîl jî dikin ku naxwazin têkiliyên wan xirabibin û gorî berjewandiyê xwe nêz bibe, ev jî tê xuyakirin ku Dewletên Navnetewî ne li gorî mirovahiyê, edelet û qanûnî tevdiger, ew li gor berjewandiyên xwe gav tavêjin. Çima rojekî ji bo pirsgirêka kurdan neciviyane û nîqaş nekirin, em ne li dijî kesî ne, tenê tiştê em dixwazin mafê me ye û jiyanekî azad bijîn, lê vê ji bo xwe zehmet û xeter dibînin. Dewletên Navnetewî ji bo pêşketina azadiyê û demokrasiyê çavê xwe digirin û li dijî wê dirabin. Û ev tişt jî rê dide êrişan, dagirkerî û binpêkirina mafê civakê, lê em dikarin bêjin ku bingeha îrade û israsê gel e. Dema em wiha dibêjin ne ku em nikarin xwe biparêzin, em baş dikarin xwe biparêzin û mafê xwe bi dest bixin. Şoreşa ku hat destpêkirin û bidestxistin bi îrade, israr, hêza civakê û bi fikir û felsefeya Rêber Apo hat bidestxistin, ne bi pêşgirtiya dewletan hat bidestxistin, dewletên Navnetewî ji bo me tiştek nekirine û em li benda wan jî namînin, ji ber ku îro me xwe bi rêxistin kiriye û bera civaka Navnetewî ji xwe re li israr û serkeftinên me temaşe bikin.

**Nameya Rêber Apo ji bo gelan Tê Çi wateyê?**

Di 23`ê Cotimehê de bi riya Omer Ocalan hevdîtin bi Rêber Apo re hat çêkirin û nameyek ji aliyê Rêber Apo ve hat şandin, ew name di hindirê her kesî de kêfxweşî û hezek da avakirin ku hêviyê gel nûjen kir û di heman demê de hêviya azadiya fîzîkî nûjen bû. Dema Rêber Apo got”Hêza min ya tewrîk û piratîk heye ku ez alozî û şer veguherînim qada siyasî û qanûnî.”, ev jî wê bibe sedemek avakirina pêvajoyekî nû di nava civakê de, Rêber Apo bi van gotinê xwe hêvî, îrade û moral xurt kir. Ji ber vê yekê gotinek ji gotinên Rêber Apo hêjaye hemî niqaş û civînin dewleta Navnetewî, bê guman em hêz û fikir ji Rêber Apo digirin û wiha em gavên xwe tavêjin.

# Pêkanînên asîmîlasyonê yên bêsînor

**Ji ramanê Rêber Apo**




Di vê demê de çanda Kurd bi tevahî hêmanên xwe yên maddî û manewî ji sedî sed hatiye înkarkirin û qedexekirin, bi pêkanînên asîmîlasyonê yên bê sînor, xwestine qirkirina çandî temam bikin. Ji bo Kurd hebûna xwe ya çandî li ser piyan bigirin, îmkan nedane ku bi tenê dibistana 'baxçeyê zarokan' jî vekin. Pêkanîneke welê ye ku mînakeke wê ya din li dinyayê tineye. Di xaleke bi tenê ya qanûnê de ji îfadeya nasnameya çandî re cih nehatiye veqetandin. Çanda Kurd tevî hêmanên xwe hemûyan ango wêje, dîrok, muzîk, resim û hwd. li derveyî huqûqê hatiye hesibandin. Li ser rûyê erdê jî emsaleke duyemîn a vê yekê nîne. Der barê Kurdan de çi hêmanên divê bêne hilweşandin û tinekirin hebin hatin hilweşandin û ji holê hatine rakirin û yên divê bêne bikaranîn jî bi çanda dewleta netewe ve entegre kirin û helandin, ji çanda Tirk hesibandin. Bi qedexekirina zimanê dayikê re navên dîrokî yên gund, bajar, herêm û dayiknîştiman hemû hatine qedexekirin û li şûna wan navên Tirkî yên 'Tirkê Spî' hatine danîn û bi vî awayî hukim dane ku rastî wê bi hêsanî bêne tesfiyekirin. Tevahiya şêwazên îfadeyê yên çanda Kurdî ango wêje, muzîk, resim, dîrok û zanist di çarçoveya heman qedexeyan de girtine û bêhtir bi çavsorî bi ser de çûne, yên di van qadan de xebatê dikin ne ku bi tenê li derveyî huqûqê hesibandine, kirine mehkûmê bêkarî û xizaniyê û ew tevizandine. Ji bo Kurd karibin bijîn şert ew e, divê ji çanda xwebûnê bigerin û ev pêk anîne. Nemaze piştî dema isyanan ekonomî, huqûq û siyaset weke sîlehên herî bi bandor ên tesfiyeyê hatine bikaranîn. Piştî van pêkanînan a li dawiyê mayî Kurdekî ji xwebûnê dest kişandî û çandeke Kurd a weke meyt û beratê ye ku kî nêzîkê wê bibe ji serî ve belayeke mezin bi serê xwe de tîne. Çiqasî ev rewş bê qebûlkirin, ewqasî jî mirovî tine dike. Bêguman weke rizîna hêmanên berate û meytekî ji ber qirrakan mayî ye. Di diyardeya çandî ya Kurd de pêvajoyeke mezin a rizînê pêk hatiye, pêk tê.

KEVNEŞOPIYA DESTHILATDARIYA ÎSLAMÎ YA BÛRJÛVABÛYÎ HELWESTEKE HÎN PAŞVERÛ NÎŞAN DA

Ji rêûresma deshilatdar a Îslamî ya bûrjûwayê nehatiye ku ji nêzîkatiya Tirkê Spî bibihure heta ji wê paşketîtir e. Li dijî hebûna çandî ya Kurd tevî rêbazên laîk modernîst, rêûresma Îslamî jî bi kar aniye û di bin navê senteza Tirk-Îslamê de milletperestî hê dijwartir kiriye û pêk aniye. Nexasim kengî di tesfiyeyê de Tirkkirina laîk kêm ma, motîfên Tirk-Îslamê kirin dewreyê. Di serî de terîqetên Neqşî û Qadirî, bi tevahî amûrên dînî di vê mijarê de weke amûrên tinekirina çandê hatine bikaranîn. Serokatiya Karûbarên Diyanetê Ya Fermî bi Komarê re hat avakirin û ji wê rojê ve di xizmeta laîkgiran de hatiye xebitandin. Nexasim girêdana Kurdan bi çanda dîn îstîsmar kirine û bi giranî dîn weke şêwazekî komplowarî bi kar anîn. Naveroka xisletên terîqetên xwedî rêûresmeke berxwedêr, hatin pûçkirin û ew ne li gorî armancên damezrandinê, berevajî van armancan bi kar anîn. Têkoşîna milletperestiya Tirkê Spî (rojane bi awayekî berbiçav CHP, MHP û yên weke wan) li dijî çanda jiyana azad û berxwedana PKK'ê bêkêr bû, lewma li şûna wê yan bi wê re, li gorî polîtîkayên dewleta netewe (tevî ku bi prensîbên Komara Atatirk re li hev nakin) pêkhatinên Îslamgiriya Tirk temsîl dikin (di serî de AKP, partî û ekolên mîna Millî Goruşê û yên weke wê) bêyî ku fikaran bikin bi kar anîne. Dema ku mijar bûye hebûna çanda Kurd, gelek partî û ekolên Îslamgir bi awayekî biçin 'Seferên Xaçperestan' tevgeriyane û ev şêwaz weke pêdiviyeke 'yekîtiya millî û yekparebûnê' hesibandine.

ÇANDA JIYANA AZAD Û BERXWEDANÊ YA KURDAN

Di demên dawî de piştî ku hat fêhmkirin hebûna çanda Kurd nayê tinekirin, bi ferzkirina hegemonya global polîtîkayên tinekirinê yên ji rêûresmê hatine sistkirin rê li ber pêkhatinên seriyekî wê yê sexte bigihîje heta çanda dewleta netewe ya Kurd hatiye vekirin. Di vê de hêmana diyarker, çanda jiyana azad û berxwedanê ye. Bi vê Kurdîtiya ku bi şêwazekî komplowarî, sexte û naveroka wê pûç, hedefa bingehîn çanda civaka neteweyî ya Kurd a demokratîk û şoreşger e. Mîna ku Kurdîtiyeke lîberal a bûrjûwa bi vî şêwazî heye, hewl didin vê nîşan bidin û dixwazin wê li şûna çanda jiyana azad û berxwedana Kurd bi cih bikin.

Ev rêbaz, ji aliyê hegemonya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst ve, ji roja ku derketine holê ve li dijî tevahiya îdeolojiyên şoreşger, sosyalîzma pêkhatî û çandên rizgariya neteweyî pêk anîne bi kar aniye û di vê de têra xwe jî bi ser ketiye. Hegemonya îdeolojîk a lîberal di sêsed salên dawî de nexasim di serdema şoreşan de ev fonksiyona xwe hem bi amûrên hûrûkûr, hem jî bi yên çor bi awayekî serketî pêk aniye û di vê de têra xwe bûye xwedî tecrûbe. Ezmûnên sosyalîst, demokratîk û neteweparêz ên bi serketin jî nikarîbûn xwe ji hegemonya îdeolojîk lîberal a modernîteya kapîtalîst rizgar bikin, nikarîbûn xetên zelal bikişînin nava xwe û wan, û lewma di nava wê de heliyane. Bêguman ev nayê wê maneyê ku çanda jiyana azad û rewşa berxwedanê bi temamî tine bûye; ev piştrast dike ku zordestiya hegemonîk a di dîroka şaristaniyê de timûtim kiriye mînakeke wê bi awayekî bêhtir pêşketî bi serketî bi pêş xistiye û pêk aniye.

Tevahiya dîrokê îdeolojiyên hegemonîk û çandên bi cihkirî yên li ser çanda jiyana azad û berxwedana Kurd hatin ferzkirin pêkanînên xwe yên herî dijwar û asîmîlasyonîst di pêvajoya modernîteya kapîtalîst de kirin. Ev rewş bi naveroka faşîst a modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Kara herî zêde îndustriyalîzmê, îndustriyalîzm jî dewleta netewe mecbûrî sîstemeke koletiyê dike. Di asta gerdûnî de qirkirinên çandî yên pêk tên ji bo ev sîstem fonksiyonel bibe ji wan pêkanînan e ku timûtim serî li wan didin. Qirkirina çandî ya Kurd ji wan mînakên sereke ye ku vî rengê heyînê yê sîstemê darî çav dike. Qirkirin weke ku tê îddîakirin ji diyardeyeke Tirk, Ereb, Cihû yên ku her yek ji wan diyardeyeke civakî ye yan jî ji diyardeyeke neteweyî pêk nayê. Qirkirin diyardeyek e ku bi şêwazê mêtinkariyê yê modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Lê weke ku xuya dike, qirkirinê mîna diyardeyeke di navbera neteweyên modern de pêk tê nîşan didin. Çandan bera hev didin heta bigihîjin qirkirinê, eger vê nekin meyla kara herî zêde ya kapîtalîst kar nake.

Pêvajoya qirkirinê ya dewleta netewe ya Tirk li ser hebûna çandî ya Kurd dimeşîne, bi heman awayî û pêve girêdayî, ji aliyê dewletên netewe yên din ên parçeker dewletên Ereb û Îranê jî tê meşandin. Li gorî mentiqê sîstemê, bi hev re parçekirin û tinekirin ji bo serketinê hewce dike. Di van demên dawî de ceribandina koalîsyona antî-Kurd a di navbera dewletên netewe yên Îran, Sûrî û Tirkî de bingehê xwe yê dîrokî heye. Lê kengî ji ber petrolê û ewlekariya Îsraîlê berjewendiyên hegemonya global bi yên dewletên netewe yên xwecihî re li hev nekin, ev pêkanîn weke berê bi hêsanî nameşin. Nakokî dike ku carinan derz li sîstemê bikevin. Di vê rewşê de ji bo tevgera jiyana azad û berxwedana çanda Kurd careke din şens heye bi roleke dîrokî rabe; ango li dijî modernîteya kapîtalîst a hêza herî dawî ya navendî ya şaristaniyê ye, firsend çêdibe modernîteya demokratîk xwe weke alternatîfeke bi hêz pêşkêş bike. Çanda Kurd a modern ji ber sedemên xweser bi tenê dikare xwe bi hêmanên modernîteya demokratîk bigihîne serketinê. Em dema serketin dibêjin, em behsa mayîndebûna çanda jiyana azad û hebûna wê ya nayê tinekirin dikin. Formê bingehîn ê vê jiyanê, ekonomiya kominî ye ku cih dide bazara civakî, îndustriya ekolojîk û neteweya demokratîk. Kurdistan û rastiya Kurd a hemdem bi awayekî dîrokî çawa ku di derketina holê ya sîstema şaristaniyê de bi rola dergûşê rabûne, şensê wan heye ku ji bo modernîteya demokratîk weke sîstem xwe piştrast bike dîsa bi rola dergûşê rabin. Çanda demokratîk ne bi tenê weke çanda jiyana modern a Kurd, weke şensekî herêmê û mirovatiya gerdûnî, li ser vî bingehî bi rola xwe rabe, ev yek xwedî girîngiyeke dîrokî ye.



## Dewleta Tirk ji bayê guhertinê ditirse

**Dilyar Cizîrî**

Di demekê de Şerê di navbera Israîl û Hemas û Huzib El-Ah a Lubnanê de derketiye asta herî jor, di heman demê de Îsraîl û Îranê gefan li hev dixwin û bi fûziyan êrişî hev dikin, tirsa gelek aliyan zêde bû ye. Dewleta Tirk yek ji wan aliyên ketine nava tirs û fikaran. Hesabê rewşeke nû ya Rojhilata Navîn dikin.
Tişta tirsa rayedarên Tirkiyê zêde dikin siyasetên hikûmeta AKP/MHP'yê ya derve ye. Di çend salên dawî de derek nema û dewleta Tirk destê xwe dirêjî wê nekiriye. Ji Sûriyê bigre heta Iraq, lîbiya û heta Efrîqiya şaxên xwe di aliyê leşkerî de dirêj kirine. Wan wiha xeyal dikirin ku piştî 2015'an bi ruxandina pêvajoya Aşîtiyê re ew xwedî hêzeke mezin in, bi taybet balafirên wan ên bê mirov pêşketine, ew ê karibin di tevahî herêmê de serweriya xwe feriz bikin. Wan wiha texmîn dikirin, wê bi wan balafiran karibin tevgera azadiyê li Bakur û Başûrê Kurdistanê tune bikin. Li Rojava jî wê karibin serweriya xwe li ser her derê feriz bikin. Wiha bi fikara hindirê wan wê saxlem bibe, destê xwe avêtin her derê.
Şerê xwe yê li dijî herêmên Parastinê yên Medya jî derxistin asta herî jor, hemû cûreyên çekên qedexe yên NATO'yê bikar anîn. Çend êrişên tunekirinê dan meşadnin. Di encam de hemû êrişên wan têk diçûn. Yê serxistin bi dest dixist gêrîlayên tevgera azadiya Kurdistanê bûn. Ev serxistin di Newroza 2024'an de bi mizgîniya tevgerê ya derbarê xistina balafirên bê mirov ên dewleta Tirk re derket asta herî jor.
Di wê daxuyaniyê de Fermandarê Biryargeha Navendî ya NPG'ê Murat Keraylan got bi destxistina çeka nû ya li dijî balafirên bê mirov wê berê têkoşîna azadiyê bide aliyekî din. Tişta niha tê jiyankirin, gotina Fermandariya NPG'ê isbat dike.
Çend sal in tevî hevkariya PDK'ê û bikaranîna hemû cûreyên çekên pêşketî li Başûr nikarîbûn gavan bavêjin. Li Bakur encamên hilbijartinên şaredariyan li ber çavên her kesî bû. Li Rojava û Şengalê jî em dibînin tevî êrişên wan rêveberî di nava hemû şert û mercan de bi rê ve diçin.
Çalakiya li Enqerê ku bi destê qehremanên fedayî yên HPG'ê ve hate kirin, têkçûyînên dewleta Tirk ku me rêz kirin zêde kirin. Çalakî li Enqere û li dijî kargeha herî mezin a çêkirina balafirên bê mirov pêk hat. Ew kargeh yek ji navendên herî bi ewle yên dewleta Tirk in. Derbaskirina wê navendê tê wateya têkçûyîna sîstema ewlekarî ya dewletê.
Tişta balkêş çalakî di demekê de Erdogan li Civîna Birêke amade bû, pêk hat. Di heman demê de di wê rojê de piştî 44 mehan rê hate dayîn Rêber Abdulah Ocalan hevdîtina malbatê pêk bîne. Piştî çalakiya Fedayî ya Enqerê ku di dilê dewletê de bû, dewleta Tirk êrişeke hovane li dijî Rojava pêk anî. Cihên xizmetguzarî, navendên sotemenî û her cihekî sivîl bombebaran û topbaran kirin. Bi rastî êrişên wan zirareke mezin pêk anîn, lê her ew êrişên xwe zêdetir dikin, nas bikin ku ew lawaz bûne. Ev hîn zêdetir wê di demên pêş de diyartir bibe.



# 'Armanca êrişan têkbirina vîn û baweriya gel e'

Hevserokê Konfedraliya Rêxistinên Civaka Demokratîk Cîhad Hesen diyar kir ku armanca hedefgirtina binesaziyên herêmê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve, têkbirina hêvî û îradeya civakê ye û wiha got: "Dagirkeriya Tirk hebûna herêmek demokratîk li kêleka xwe qebûl nake, ji ber wê êrişî herêmê dike."

**Diyana Mistefa/Reqa**

Careke din ji bo qirkirina gelê herêmê dagirkeriya Tirk di şeva 23'ê Cotmehê de, dest bi êrişeke berfireh li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Dagirkeriyê di êirşên xwe de rasterast binesaziya herêmê, navendên stratejîk, xizmetguzarî, sivîl û mal û milkên wan dike hedef. Di encama êrişan de, bi 10'an welatî şehîd bûne û binesaziya herêmêm ziyanên gelek mezin dîtiye.
Derbarê êrişên dagirkeriya Tirk hevserokê Konfedraliya Rêxistinên Civaka Demokratîk Cîhad Hesen ji rojnameya me re axivî.
Cîhad Hesen diyar kir ku piştî şoreşa 19`ê Tîrmehê dewleta tirk tu carî qebûl nekir ku kurd bibin xwidî proje û got: "Niha weke dewleta tirk û êrîşên wî li ser herêmên me weke Rojava û Bakur-Rojhilata Sûriyeyê ve, em tenê bi vê bûyerê ve girêbidin ne raste, ji ber ku dewlete tirk ji demên bûrî de û ji destpêka şoreşa 19`ê Tîrmehê ve mêjî û zihniyeta wê gelê kurd qebûl nake. Herwiha qebûl nake ku herêmekî demokratîk di tanişta tirkiye de were demezrandin. Ji ber vê yekê dewleta tirk her tim dixwast bi awayekî zindî nekeve vê şerê û di rêya çeteyên xwe re şerê vê projê û hebûna gelê kurd dikir. Dema ku herêma ji Cerbils heta Izazê di destê çeteyên DAIŞ'ê de bû, herwiha dema DAIŞ'ê derdora Kobanê dagirkir û bû çîranê Tirakan, dagirkeriya Tirk yek carê êriş çeteyan nekir û ew nekirin hedef. Lê piştî ku herêm ji aliyê gelên wê ve hat rizgarkirin, dagirkeriya Tirk dest bi êrişan kir."

### Dagirkeriya Tirk dixwaze bi riya êrişan pirsgirêkên xwe yê hundirîn binxumîne

Cîhad wiha axaftina xwe berdewamkir û got: "Dewleta tirk iflesa xwe di milê civakî û leşkerî de heye, lewma li dijî binesazî û her tiştê li herêma me êrişan pêk tîne, gelek armancên wî ji vê yeke hene, yek ji wan armancan jî ku gel bêzar û tengav bike da ku li hemberî rêveberiyê derkeve. Bi van êrişan dixwaze pêdiviyên jiyanê yên gel neyên peydakirin. Lewma dema ku binesaziyê dike hedef dixwaze hêviya gel ji Rêveberiya Xwaser bişkê.

### Armanca û xwasteka dewleta tirk gel bi piştgirya rêveberiya xwaser sûcdar bike

Cîhad Hesen her wiha got: "Armanca dewleta tirk diyar bû ku îro nikarê tu zirarê bi hêzên me yên leşkerî bike, lewma dixwaze bandorê li civakê bikê, her wiha bi êrîşên ku heya niha ew kiriye zêdetirî 17 kes û zarok şehîd ketin û bi dehan kesên birîndar bûne û hemû ji sivîlane ew bi xwe dide xiyakirin ku armanca wî ne QSD`e, ew dixwazê civakê sûcdar bike ku ev civak çawa li pêş îradeya xwe ne, lewma bi vê êrîşan dixwaze bigihîne gel ku hûn çima piştgiriya Rêveberiya Xweser dikin, hûnê bibin hedef. Gelên azad fikreke azad belav dikin, gelên ku bibin xwadî îrade wê bandora xwe pir li ser Tirkyê jî hebe, ji ber ku tirkiye tu carî mafê mirovan wekî îredeya civakê qebûl nake, planê wî ji vê şerê û bi taybet binesazî ku îradeya civaka me hedef bigire."


### Armanca dewleta tirk qirkirin û tunekirina hebûna kurdan e

Cîhad Hesen da xuyakirin ku dagirkeriya Tirk tu caran gelê kurd qebûl nake û axaftina xwe wiha qedand: "Dewleta tirk ne tenê li dijî kurdan şer dikê, beriya sedsalî dewleta tirk qirkirina herî mezin li dijî gelê ermenî pêk anî û di sedema wê de zêdetirî milyon û nîv ji gelên ermenî hatin qirkirin û qurbanî, piştre ne tenê weke dewleta tirk lê dewleta sûriyeyê, îraq û îran weke li hevkirinekê li dijî gelê kurd kirin û hemû plan kirin ku qlra kurda bînin ji aliya çandî de, ev weke sadsalin ku gelê kurd li çar parçeyên



Kurdistanê di nav qirkirina siyasî û çandî de, lê para herî mezin di bakur de bû ji ber ku hejmarî herî mezin li wê derê bûn, dewleta tirk piştî 1925`an de dest bi êrîşên xwe li dijî kurdan kirin bi taybet piştî şoreşa Şêx Seyîd û Seyid Riza pir kumkûjiyên mezin pêk anîn. Dagirkeriya Tirk tu carangelê kurd qebûl nake , ji ber wê herdem destê xwe dayê Îran û iraqê da ku kurdan qir bike. Her wiha bi rêjîma esed ra jî ruxmî piştî ev qas şer û qetila giştî û daxuyaniyên tirkan ji bo rêjîma esed lê ev tişt neanî aqilê xwe û diçe dixwaze destê xwe di destê rêjîma esed kê ji bûna kurdan tune bikin û rêveberiya xwaser bişkînê. Armancî dewleta tirk gelek xwiya ye lê tu carî em nahêlin bigihîşin armanca xwe û tu carî em xwîna şehîdên xwe li erdê nahêlin ne bi bombebarankirina me û ne binesaziyên me. Em ê heya dilopek xwîn di cane me de berxwabidin û tu carî derfetê nadin dewleta tirk îradeya me û gelê me gelê azadîxwaz bişkîn e."

## Êrişên dagirkeran û helwesta Hikûmeta Şamê



**Zekî Bedran**

Êrîşên hilweşîner û dijminatiya dewleta Tirk a li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê didomin. Herî zêde êrîşên wan li dijî qadên jiyanê yên gel tên kirin. Armanca wan ew e ku herêmê bê niştecih bikin, xelkê neçarî koçberiyê bikin û jîngeha bawerî û aramiyê têk bidin. Bingeha van hemûyan jî plana qirkirina Kurdan e ku ev sed sal in didin meşandin. Dibêjin Kurd li tu derê cîhanê nikarin bibin xwedî statû û nasname.
Hewl didin hemû êrîş û sûcên ku bi PKK'ê, rewa bikin û normal bikin. Jixwe PKK'ê jî ketiye lîsteya rêxistinên terorê! Dibe ez ê bibêjim li dijî PKK û terorê têkoşîn dikim û ez ê bi vî awayî ji vî karî derbikevim. Di rastiyê de dema ku PKK'ê li çiya yan jî li her devereke Tirkiyê çalakiyekê dike, artêşa Tirkiyê berê xwe dide Rojava û Sûriyê. Rojava di destê wan de bûye rehîne. Di heman demê de dixwazin PKK'ê sînordar bikin û bêçalakî bihêlin. Hevkêşiya (Denklem) "Eger hûn li min bixin ez ê jî li Rojava bixim" ava kiriye.
Ji bo Rojava bike hedef, dîtina hincetan gelekî hêsan e. Bi kêmanî wê bibêjin "ji sînorê Sûriyeyê sizme kirine" û vê yekê wekî qilifekî bikar bînin. Erdogan radibe û dibêje, "Yên ku çalakiya Enqereyê pêk anîn, ji sînorê Sûriyeyê sizme kirin." Her çend di sînorê Sûriyê re derbas bibin jî. Ev yek çawa dikare bibe hincet ji bo êrîşa li hundirê Sûriyeyê, qadên jiyanê yên gel û kuştina bi dehan mirovan? Ger wisa bûya, pêwîst e Tirkiye timî were bombebarankirin. Beşek ji çeteyên DAIŞ'ê yên ku li Ewropa û Rûsyayê komkujî pêk anîn, di ser Tirkiyeyê re derbasî wan welatan bibûn. Lê kesî Tirkiye bombebaran nekir.
Tirkiyê li ser sînorê Sûryeyê dîwar çêkiriye û bi kamerayên termal tije burc kiriye. Ew pesnê xwe didin ku wan sînorên xwe teng kirine. Tevî vê yekê jî hejmara mirovên ku li van sînoran dikujin ji hemû deverên cîhanê zêdetir e. Kesên li zeviyên xwe dixebitin jî bi awayekî keyfî dikûjin. Loma jî kesî şer îlan nekir û êrîşî Tirkiyeyê nekiriye. Jixwe ewqas şumbûna (şımarıklık) wan û pêkanînên qetilkirinên wan, ji ber ku heya niha çi kirine ji wan re fêde maye ye.
Tirkiye tu carî rêgezên şer ji bo xwe ferz nedîtiye. Li dijî gerîlayên Kurdistanê her cure çekan bikar tîne, çekên kîmyewî yên qedexe jî di nav de ye.
Êrîşên xwe yên dawî ên li ser Rojavayê Kurdistanê wek navend û çeperên PKK'ê nîşan dan. Wêneyên cihên lê hatine lêdan jî di çapemeniyê de cih girtine; firinên nan, tesîsên gazê, yên ard, depoyên genim û nokteyê asayîşê bûn. Bi dehan kes mirin û birîndar bûn. Piraniya wan zarok û sivîl bûn.
Em bêjin ev der eydî PKK'ê ne. Ev cihên ku em behsa wan dikin di şer de nayên xistin. Ew di çarçoveya sûcên şer de ye. Hûn nikarin her tiştê ku dewletek an hêzek pê re şer dike bombe bikin. Di şer de tenê hedefên leşkerî tên xistin. Lê Tirkiye ne li gor tu qaîde û qanûnan e. Ji bilî vê, ew ji tevahiya cîhanê re derewan dike. Çi eleqeya PKK'ê bi firneyên nan re heye, ez nizanim, bi vî karê Rojava re? Ewqas bi dehan sivîlên ku hatin lê dan, di bin çî PKK'ê? Di serî de Erdogan tu wijdan û nirxên însanî di wan de nemaye. Ev mirovên bêşerm û bê ar in.
Helwesta hikûmeta Sûryeyê ya li hember van êrîşan jî hêjayî nirxandinê ye. Şam xwe wek nûner û hikûmeta fermî ya Sûryeyê dibîne û li hemû herêmên ku Tirkiye lê xistiye yekîneyên leşkerî yên artêşa Sûryeyê hene. Hêzên artêşa Sûriye li ser sînorê Şehba heta Kobanê û Dêrikê bi cih bûne. Tevahiya erdnîgariya ku hatiye lê da, xaka Sûryeyê ye. Yên hatin qetilkirin jî welatiyên Sûriyeyê ne. Her wiha hikûmeta Şamê li cîhanê propaganda û belav dike ku nûnertiya gelên li van herêman dike ye.
Beriya her tiştî erka dewleta Sûriyeyê heye ku li hemberî dagirkerî, êrîş û komkujiyên Tirkiyeyê raweste. Ev hem erkek qanûnî û hem jî erkek exlaqî ye. Dibe ku pirsgirêkên wan bi gelê herêmê re hebin. Ev herêm ji Sûryeyê cuda nebûye û dewleteke cuda ava nekiriye. Gel xwedî nasnameya fermî ya Sûriyeyê ye. Divê dewlet xwedî erk be ku van hembêz bike û li mafên wan bigere. Ger ev yek neyê kirin êdî tiştekî ku ji gel re bibêje namîne. Dema gel bi êrişan re rû bi rû ma û li beramberî van êrişan hikûmeta ku bê bertek bimîne, wê çawa jê bawer bike?
Divê hikûmeta Sûryeyê vê mijarê bigihîne saziyên wek Komkara Ereb û Neteweyên Yekbûyî ku endamê wan e û li dijî Tirkiyê helwestê nîşan bide. Herî kêm divê nîşanî cîhanê bide ku li sînor û welatiyên xwe, xwedî derdikeve. Baş e, Sûriye ne bi hêz e ku bi Tirkiyeyê re şer bike an jî naxwaze şer bike. Lê pêwîst nake û nayê wateya ku li hember van herêmên ku êriş pêk tên û sucên ku tên kirin bê eleqe bimîne.Hikûmeta Şamê ne avakirina pêwendiyeke saxlem bi gelê xwe re dibe sedema qutbûna hestyarî û dûrbûnê. Eger Şam bifikire ku Rêveberiya xweser wê bişkê û xwe bavêjin ber deriyê min, ev xerabtir e. Ger mirov di demên dijwar de alîkariya hev bikin û hevkariyê bikin, ev yek yekîtî û baweriyê xurt dike.



## Dîsa ketin bextê Kurdan

**Farûk Sakik**

Ev pêvajoya nû ku destpêkirî piştî bi Rêber apo re hevdîtina parlamenterê DEM Partî Omer Ocalan, derbasî qonaxeke nû bû.
Ji bo nirxandinek esas were kirin, heta ji Rêber Apo peyamek neyê zehmet e. Axaftinên aliyê dewletê tên kirin, bi temamî ji bo amadekirina raya giştî ye. Ji bo hêza xwe ya siyasî biparêzin, hin argumanên ku Kurdan diêşînin bi kar tînin. Civaka Kurd ji van kiryaran pir aciz in. Ez bawerim piştî ku Rêber Apo tevlî pêvajoyê bibe wê nirxandinên ku îroj tên kirin tev vala derkevin. Armanca destpêkirina vê pêvajoyê her çiqas zelal nebe jî, dewleta Tirk di rewşeke xeter de ye ku Bahçelî ev maraton da destpêkirin. Di Şerê Sêyemîn ê cîhanê de guhertinên wê li Rojhilata Navîn werin çêkirin wê li ser dewleta Tirk bandoreke mezin çêke. Nexşeya di dema 'Peymana Sewrê'de ku we dîtibû, îhtîmaleke ji nû de were xêzkirin. Dewletên ku di şerê yekemîn ê cîhanê de bi cedwelan hatibûn xêzkirin, wê sînorên wan ev car bi xetên gaz û petrolê werin xêzkirin. Sînorên dewleta Tirk ên îro, wek sînorên Lubnan, Urdun, Sûrî û Iraqê di wê serdemê de hatibûn destnîşankirin. Di vî şerê îroj de, di operasyona Îsraîl dayî destpêkirin de, Tirkiye jî wê para xwe bigire. Ev yek ji aliyê Erdogan ve hatibû îtirafkirin. Ji bo pêşî girtina vê bahoza Îsraîlê ya nêz dibe, rûpelên dîroka xwe ji nû de vekirin. Di nav van rûpelan de, rastî Kurdan hatin. Di şerê Milazgirê de ji çolên Asya Navîn hatibûn û ketibûn Anatoliya. Ka dibêjin deriyê Anatoliya li Milazgirê vebûn. 10 hezar şervanên Kurd ku erdnîgariya vê herêmê baş dizanibûn di şer de ji Tirkan re rêbertî kirin. Ya duyem hevkariya Kurd û Tirkan di şerê Çaldiranê de bû. Şerê Çaldiranê an jî Şerê Ebexê, di 23'yê Tebaxa 1514'an de pêk hat û bi serkeftineke Împaratoriya Osmanî li ser Împeratoriya Sefewî bi dawî bû. Kurd û Tirk sedsalan bi hev re jiyan.
Ya sisiyan, di şerê îstiklalê de hevkariya Kurd û Tirkan çêbû. Di serdema Şerê Yekemîn ê Cîhanê de bi Sewrê, ji împaratoriya Osmanî ji wan re parçeyek biçûk mabû û derdorên wan jî hatibû dagirkirin. Bi hevkariya Kurdan ev sînorên xwe yên îro parast.
Di dîrokê de rastî van her sê hevkariya Kurd û Tirkan hatibûn. Lê ev car wisa hêsan nebû. Kurd di Rojhilata Navîn de xwedî hêzek mezin in. Ev şerê em bahs dikin di nav sînorên Kurdan de derbas dibin.
Li Başûr herêmêke azad heye. Li Rojava sîstema rêveberiya xweser roj bi roj sîstema xwe dide qebûlkirin. Li Bakur xwedî siyasetek demokratîk e ku hevsengiyên îqtîdaran diguhêrîne. Li Rojhilat jî di paşerojê de heger li Îranê şer belav bibe Kurd jî bi hêza xwe ya mezin wê dakevin qada şer. Gelek alî di şerê Îranê de dixwazin Kurd li kêleka wan cîh bigirin.
Em hêza Kurdan a eskerî jî li aliyek dihêlin. Tirkan dema ji nav rûpelên dîrokê derketin, xwestin bi Kurdan re hevkariya çaran bidin destpêkirin. Di sala 1919'an de Kurd birêxistin nebûn. Serekên eşîr û malbatan li ser navê Kurdan biryar didan. Zû dihatin xapandin. Îro pêşeng-rêber-serok-lîderê Kurdan Abdullah Ocalan heye. Bi komplo û bi tecrîdan nikaribûn pêşî li têkoşîna wî ya doza Kurdan re bigirin. Îroj wa li ber deriyê wî ne û ji wî alîkarî dixwazin.
Li gor em geşedan û axaftinên rojane dinêrin lihevkirinek heye. Herkes baş dizane Rêber Apo mafê Kurdan wê baş biparêz e. Wisa hevkariya çaremîn a Kurd û Tirkan wê wek argumanên Bahçelî bi kar tîne dest pê neke. Evcar ji bo gelên heremê ji vî şerî zêde êşê nebînin nexşeriya Abdullah Ocalan wê bikeve dewrê.